Kurdistan

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çileya Paşîn / 1 - 1 - 2022 Kurdistan-Hejmar (212) www.pdk-s.com

# Divê Sînorek ji kiryarên ciwanên PKK re were danîn

Kurdistan **Salar Kîkî**



Sekreteriya Gişî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) di daxuyaniyekê de ragihand, “Di dema ku gelê me bi awayekî aştiyane û şaristanî li pêş nivîsgehên ENKSê Roja Ala Kurdistanê pîroz dikir, grûpa (Ciwanên Şoreşger) a ser bi PKKê êrîşî xelkê sivîl kirin û li wan dan û hejmarek ji wan birîndar bûn, çalakvan Nîzamedîn Elîko ji ber giraniya birîna serê wî de, ji bo nexweşxaneyê hat veguhastin.” Sekreteriya Gişî ya ENKSê diyar kir jî: “Wê girûpa bê kontrol jî molotofek avêt baregeha Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Dirbêsiyê û bi temamî şewitand.” Herwiha di daxuyaniyê de hat: “Em van kiryarên tirsandinê yên bûne gef û metirsî li ser jiyana welatiyên me, bi tundî şermezar dikin û tekez dikin ku ev kiryarê dê me ji berevanîkirina li doza gelê Kurdî ne û naskirina mafên wî yên netewî di çarçoveya çareseriyeke siyasî ya berfireh a kirîza Sûriyê de nade aliyekî.” Sekreteriya Gişî ya ENKSê ENKSê daxwaz ji Fermandariya HSD, Amerîka û Hevpeymaniya Navdewletî kir, van kiryarên tundûtûjiyê yên li dijî gel rawestînin û hesab ji encamderên wan bipirsin. Ehmed Elî wiha li ser vê mijarê dibêje, PYD û PKK û alîgirên wan bi van kiryaran dixwazin ENKS û alîgirên wê bitirsînin,û wan ji doza wan ya rasteqîne vegerînin, lê ev kiryar xelkê me natirsîne, û dê li ser doza xwe berdewam bin.

Canda Omer jî wiha jî dibêje, êdî kiryarên van grûpan li Kurdistana Sûriyê nema têne qebûlkirin,zarokan direvînin,ofîsan dişewtînin, û gelek kiryareên din dikin.

# Êrîşa ser dergehê Pêşabûrê pilankirî bû

Kurdistan-Îmad Xidir



Roja 15ê meha derbasûyî, grûpa bi navê ciwanên şoreşger ku ser bi PKK ve ye êrîşî ser xala sînorî ya di navbera Kurdistana Sûriyê û Herêma Kurdistanê de kir. Berpirsê xala sînorî yê Pêşabûrê Şewket Berbuharî jî daxuyaniyekê de ragihandibû, zêdetir ji sed kesî û li ber çavê xelkê û asayişa Sêmalka, êrîş kirin ser xala Pêşabûrê. Di encama de, hejmarek ji pasewanan bi giranî birîndar bûn û camên otomobîla agirkujê şikandin. Parêzgarê Duhokê Elî Teter derbarê girtina deriyê sînorî yê di navbera Herêma Kurdistanê û Kurdistana Sûriyê de ragihand, PKK bûye sedema girtina deriyê Pêşabûrê. Parêzgarê Duhokê Elî Teter di konferanseke rojnamevanî de got: "Li hemû cihanê nabe komek kes li pêş çavên hêzên ewlehiyê êrîş li ser aliyê din ê deriyê sînorî bikin. Mixabin, hêzeke PKKê û al û diruşmên PKKê bi dar û keviran êrîşî ser xala deriyê sînorî kir."Parêzgarê Duhokê got jî: "Rast e em Kurd in û birayên hevdu ne, lê ji aliyê pêwendî û yasaya navdewletî ve wiha tê dîtin ku beşek ji xelkê Sûriyê êrîşî ser deriyê sînorî yê Herêma Kurdistana Iraqê kiriye, polîsên me birîndar kirin û otomobîlên me şikandin."Elî Teter pirsiya jî: "Li gor yasa û pêwendiyên navdewletî, li kîjan cihê cîhanê wiha rû dide ku hin kes ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bêne komkirin, çadir ji wan re werin vegirtin û êrîşan bibin ser aliyê din ê sînor bikin?"Parêzgarê Duhokê destnîşan kir: "Sînor hat girtin, kî bûye sedema girtina derî jî diyar e. Lê eger hin pirsgirêkên diyarkirî hebin, dê bêne çareserkirin. Lê divê PKK di siyaseta xwe ve biçe."Parêzgarê Duhokê amaje bi wê jî kir: "PKK di Roja Ala Kurdistanê de jî êrîşî ser xelkê kir û rê neda xelk ala Kurdistanê bilind bikin û serê xelkê şikandin. Ev al, ne ya PDK û Herêma Kurdistanê ye, lê belê yê hemû Kurd û Kurdistanê ye. Ev al di dema hatiye çêkirin de, hemû rêxistinên Kurdan li ser erê kirine. Ev al di hemû bone û şoreşan de û li Komara Kurdistanê li Mehabadê hatiye bilindkirin. PKK bi vê siyasetê naçe serî." Wezîrê Navxwe yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Rêber Ehmed jî di konferanseke rojnamevanî de derbarê deriyê sînorî yê Pêşabûrê bi Kurdistana Sûriyê re ragehand, ew a ku li xala sînorî a Pêşabûrê rû daye, destdirêjî û binpêkirina serweriya Herêma Kurdistanê bû. Vê destdirêjiyê jî, dixin stûyê wan hêzên, ku Rojavayê Kurdistanê birêve dibin. Wezîrê Navxwe yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê got jî, heta ku ew hêz reftarên xwe rast nekin û bi dirustî rêz li xalên sînorî negirin, em nikarin jiyana xelkê bixin metirsiyê de.Di vê derbarê de Rojnameya Kurdistan nerîna welatiyên Kurdistana Sûriyê wergit. Welatiyek ku xwedî nexweşiyeke giran e wiha dibêje, ev dergeh ji bo me wek xelkê Kurdistana Sûriyê dergehê jiyanê ye ji ber ku di riya vê deriyê de me xwe li Herêma Kurdistanê çareser dikir bi taybet ji nexweşiya penceşêrê ku li nexweşxaneyên Kurdistanê bê beramber dihatin dermankirin, û ev yek ji bo me gelekî baş û guncaw bû di demekê de ku rewşa me ya abûrî gelekî xerab bûye,lewma ev kiryara hatiye kirin kiryareke nayê qebûlkirin û divê ev ciwanên ser bi PKK ve werin sizadan,ji ber ku rewşa xelkê me xiztin jêr metirsiyeke mezin de, di vê sînorek ji vê grûpê re were danîn. Welatiyek din dibêje, bila PKK û grûpên ser bi wê dev ji Kurdistana Sûriyê berdin, û kiryarên xwe dûrî deverên me bixin heta ku em bi azadî bijîn,kiryarên vê partiyê bûne bela li ser serê miletê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê, ev partî xizmeta dijminê gelê Kurd dike, niha xelkê me bê madeyên sereke ne wek şekir û evyek zirarekê dighîne xelkê me, jibilî ku di riya vê deriyê re alîkariyên mirovî derbas dibûn, û bi taybet alîkariyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî ku berdewam alîkariyan dişîne Kurdistana Sûriyê, herwiha di dema korona de Serokê Herêma Kurdistanê çend taqîgeh şandin deverên me.



# Bi xwendinê, mirov xwedî zimanekî azad e



Mahir Hesen


Hewlên Mirov di xwendin û perwerdehiyê de digihîje armancên xwe ku bi xwendinê jiyana xwe nûjen dike. Belê, bandora wê li ser civakê bi tevahî belav dibe posetîve, ji ber ku perwerde bingeha a pêşkeftina şaristanî ye û bidestve anîna aramî û ev yek dyar dibe di Cudahiya civakên pêşketî û paşverû tenê rêjeya perwerdehiyê ye. Piştre pêşketina aborî û civakî û pêşketina di hemû waran de têne.
Zanist çeka mirov a herî bi bandore di civakê de, bingeha bextewarî û xweşiya hemû mirovan e, stûna avakirina şaristanî û pêşketinê ye di her demê de.
Bila em vê yekê jî zanibin ku xwendin û zanestî rêya ji navbirina nezanî, û feqîriyê ye, girîngiya wê di her civakê de ji av û hewayê ne kêmtir e.
Zanist kevirê bingehîn e ji bo avakirina nifşekî pêşketî, ji ber ku hemî welatên pêşkeftî qedr û hurmetê didin zanistê û ji bo hemwelatiyên xwe peyda dikin. Mirov dikare li gorî serdema ku tê de dijî bimeşe û dikare jiyanek baştir ku statûya xwe û statûya civakê bilind dike peyda bike. Dema ku civak perwerde bibe û xelkê wê dibin xwendevan , bi hesanî dikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin, çinkû wê demê zanist li ber civakê ye ku di hemû qadên jiyanê de bigihîje kontrolê. Weke aborî, bazirganî, pîşesazî, çandinî û warên din ên ku ji bo her civakê bingeha hêzê ne. Bi vî awayî xwendin têra xwe bi kêrî civakê tê.Civaka ku li ser zanistê neyê avakirin, tê diyar kirin ku di her kêliyê de hilweşe û biherive.
Pêvajoya rastkirina nifşan bi hebûna sê faktoran ve girêdayî ye: perwerdekar, fêrebûn û bawerî. Armanc ew e ku xwendekar jiyanê xweş bikin û faktora sêyemîn jî bingeha perwerdehiyê ye ku mirov bi vê pêvajoyê tête meşînin. Girîng e em hewl bidin ku şert û mercên wê pêvajoyê biafirînin li rojavayê welat jî da ku tiştek wiha nebe û yek ser civaka me ber bi tunebûnê ve biçe. Kêmasiyek ku pêvajoya mezinkirina xwendinê, ji bo nifşan, an xwendekaran ji hêla nezanan an jî partiyeke ku îro zarokan ji dibistanan direvîne û wan tevlî şeran dike, bête asteng kirin. Di nav van astengan de nebûna amûrên pêdivî ye ku ji bo pêkanîna pêvajoyek rast a çandiniyê, ku di rêbazên pêşkêşkirinê de têne xuyang kirin. Û ramanên ku di dilê xwendekaran de hatine çandin, û her wiha balkişandina her du aliyan li ser proseya perwerde û hîndekariyê bidin pêş.
Her weha divê cihê kurdan de û bitaybetî rojava yê welat, pêvajoya pir girîng di jiyana nifşan û bi vî awayî jiyana civakê de ava bibe. Û ji aliyê dinve jî dive guhpêdan li ser pêşkeftina wekî huner, muzîk, hwd kirin. Yek ji girîngtirîn tedbîrên ku dikare ji bo vê piroseyê jî were girtin, giringî bi aliyê hunerî û dahêneriya xwendekaran û pêşxistina wan e, ji ber ku ev yek ji wan re dibe alîkar ku xwe û çanda xwe bidin nîşan û xwebaweriya wan zêde bike.
Xwendin û zanestî civatê diparêze û ji bo pêşdebirina wê û danîna pêdiviyên ku debara mirovan hêsan dike kar dike. Li hişê zarokan de ramanên pêşveçûna civakê tê çandin û bîr û baweriyên xwe bi mezin dibin, ji lewma civaka nezan bi qestî an jî nexwazî, bi awayekî otomatîk bi kar tînin û xelkê wê bi zimanê çek û kuştinê di axivin. Dema ku pêvajoya perwerdeyê bi awayekî rêkûpêk pêk were, nifşên ciwan xwedî şiyana avakirina civakê ne. Û pêşxistina çavkaniyên mirovî û madî ji bo xizmetkirina berjewendî û pêşketina civakê ne.
Li vir dixwazim bêjim dema ku di perwerdeyê yan jî di zanestiyê de kêmasiyek çêbibe, ev kêmasî bandorê li nifşan dike. Ji ber vê yekê bandoreke neyînî li ser civakê dike ku zirarê dide wê û jê re nigetîv be.
Her wiha têkiliya civaka heyî û nifşên xwendevan, têkiliyeke refleksîf e.
Çawa ku nifş bandorek erênî û neyînî li ser civakê dikin, civak jî bi vî awayî li wan re bandor dike. Dema ku nifş bi awayekî rast û dirust bên mezinkirin, dikarin ji hev cuda bikin ka çi bi posetîv û çi zirar e. Ew ji ramanên neyînî yên ku di nav civakê de hene bandor nabin, belkî ji bo rastkirina wan dixebitin û heta ku dibe bila bibe ji erênî sûd werdigirin.
Û gava ku ew bi nezanî têne mezin kirin, dibe ku di civakê de ji ramanên neyînî bandor bikin û hewl bidin ku xirabiyan bikin. Heta dibe ku bibe sedema têkçûn û xirabiya civakê. ji nezaniyê xetertir tune û bi vî awayî girîngiya rola xwendin di mezinkirina nifşan de diyar dibe.
Her yek ji me di vê pêvajoyê de rola herî mezin dilîze ku ramanan radigihîne û nerîna wan misoger dike. Û zelalkirina rêbaza cîbicîkirina wê ji bo xwendekaran ji bo ku civakê bi nifşên jêhatî ji bo pêşketina wê û bi vî awayî pêşketina welat peyda bike. Divê kurd bi xwe jî ji bo vê pêvajoya tevlihev ku ev pêvajo hewce dike, jêhatî be. Hişmendî, hewldan û lêkolînek mezin da ku ew bikaribe di jiyanê re xwedî biryar be , ku dibe ku bandora zanestî li ser hebe. Kurd divê ji bo welat ku dixwaze bidestbixin, bibe mînakek baş û ji ber vê yekê divê tevgera xwe rast bike. Taybetmendiyên xwe yên şexsî li ber çavê xwendekaran biparêze da ku layiqî baweriya wan be. Her weha divê kurd her guhertinên nexwestî yên ku di wê pêvajoyê de çêbibin, wek mînak. Ger kêmasiyek hebe, an jî di bin bandora ramanek neyînî de bin, divê ew aram û jîr be. Û dîtina çareseriyên nûjen û afirîner da ku ji vê kêmasiya zû xilas bibe.
Rolan desthilatdariyan gelo çiye di mezin kirina nifşan de
Rola desthilatdarî di mezinkirina nifşan de ne tenê di aliyê perwerdehiyê de ye, her wiha digihêje wêdetir.
Ew ezmûn û lêkolînên berhevkirî bikar tîne da ku hewl bide ku kesayetiya xwendekar fêr bike. Û hewl bidin ku di asta kesane de bigihîjin xalên bandorê. Ji bo ku desthilatdarî encamên pêwîst bi dest bixe, divê bi malbatê re têkiliya têkiliyê deyne. Ji bo ku ew agahiyên ku der barê zarokan de bi destbixe û bi hev re biguhere û ji bo çareserkirina kêmasiyan bixebitin. Ya ku yek ji her du aliyan bi awayekî hevbeş dualî dibîne, ev yek bidestxistina bandoreke mezin di çareserkirina pirsgirêkan de ye.
Zanestî bi giranî bi pêşveçûnê ve girêdayî ye, û ji ber vê yekê peydakirina xwendekaran pêwîste. Ji bo ku em bi hêsanî bigihîjin armancên ku em dixwazin, pêkanîna vê pêvajoyê girîng e.
Civakên serketî û pêşkeftî yên herî bi hêz di vê cîhanê de li ser çend pêkhateyan ava dibin, ku ya herî diyar jî zanist e. Zanist rêya tekane ya li ber destê mirovan , ku divê bişopînin da ku bigihijin rastiyan.
Gihîştina zanîna teqez ne tiştekî hêsan e, ji ber ku gelek lêkolîn û westiyan hewce dike. Di warê civakê de jî zanist ew e ku nifşên ciwan civak û netewe ava dikin, civakên ku xwediyê zanînê di nav civakên herî bihêz û serdest ên cîhanê de ne, her wiha ev zanîn çanda civakan û şert û mercên jiyana wan ji xizaniyê diguherîne û dike dewlemendî. Mirov di mijarên jiyanê de zanatir û bi tecrûbetir dibe û ev jî wî dike mirovekî xwedî zimanekî azad.



# Pertûka "Stranên Jînê" derket

Kurdistan-Bidûvçûn

Nivîskar û Helbestvan Ezîz Xemcivîn Pertûka bi navê "Stranên Jînê" belav kir ku helbestên stranan e, û ji aliyê weşanxaneya J&J hate çapkirin. Di vê dîwanê de 200 helbestên stranî ji bo xwendevan û bi taybetî hunermendan pêşkêş kirine. Kevala bergê pêşî ji aliyê Hunermend Welîd Tewfîq ve hatiye dirustkirin. "Stranên Jînê" bêtir ji 35 stranan ji vê pertûkê bi dengê hunermendên Kurd hatine strandin, wek: Reşad Sedo (1 stran, Zindan teng û kûr e), Koma Xanî (1 stran Zindan teng û kûr e)), Bavê Selam (1 stran), Xoşnav Eziz (3 stran), Dilocan (1 stran), Zubêr Salih (1 stran, çima ev bêdengî), Hêvî Murad (4 stran, Azadî, keserê, welatê min), Evîn Beyaz (3 stran, çavên te, nerîna te, evîndar im), Ibrahim Keivo (2 stran, dengbêjê welatê min,), Gare Sazkar (2 stran), Ali (1 stran, çavên te), Jin Xelil (1 stran), Salar Dêrikî (1 stran, yara bi destê me kedî bû), Rûbar Hiso (2 stran), Selah Osê (1 stran çavên te rengê), Koma Berxwedan û Cemal Tîrêj (2 stran, Amed, kaniya zêr im), Azad Tîrêj (1 stran, gulperî), Zuhêr Cemîl (1 stran, şêx Ednan), Şêro Betê (2 stran, li bin sîwana), Şêrzad Efrînî (1 stran).




## Sersal di civaka Kurdî de

Hozan Ebdula

Di demên berê de sersal li cem zarokan gelekî giring bû, û dibû sedema kêfxweşiyê li cem zarokan, ger, kêf, ken û henek û bîrianîn, tevî ku seqa gelekî sar bû, lê zarokan dev ji gera xwe bernedidan. Hemû kes li hêviya sala nû bû, li hêviya tiştekî nû, guhertineke bingehîn ji bo jiyaneke xweştir û geştir. Nizanim wê demê çima hestên cêwaz li cem zarokan hebû, tevî ku jiyan gelekî zehmet bû, lê di rastiyê ew yek hebû ku jiyan sade û hesan bû, tenê xelk di debara jiyana xwe ya rojane de hizir dikirin. Di bîra min de hêj ew yek maye, zarokên me li gund û bajaran jî li hev kom dibûn, amadekariyên xwe ji şeva sersalê dikirin, pilanên xwe hazir dikirin da ku berê xwe bidin malan û êdî ji xwe re şekir û fêkî û pere û gelek tiştên din kom bikin, her zarokekî hizir û fikra xwe nîşan dida. Grûpa zarokan bi hejmareke mezin û her yek jî cilekî cêwaz ligel nixumandina çav berê xwe didan malan, dengê wan digihişte asîmanê heftan, qîrîn û ken li felekê vedida, helbet di nava wan de kesek dibû qirdik û buxçikek lê di hate kirin heta ku samanên bidest bixe, bixe nav de. Hêdî hêdî zarokan li deriyên malan de didan û wiha berê xwe didane xwediyên malê û digotin"Dem û dem, nîska qedem, serê salê û binê salê xwedê zarokekî bide kebaniya malê, kebaniyê dest zêrînê, destê xwe bavêj kulînê û behra qirdik virde bînê. Qirdiko; li te nemawo, te teniya sêlê li xwe dawo û te bela gundiya li me dawo!", îca wan zarokan ji xwedî û kebaniya malê tiştên sersalê bidestxistin. Ez dikarim bibêjim ku ew zarok diçûne kîjan malê vala nedihatin û ev yek kiltûreke baş bû di nava civaka me ya Kurdî de.Hin caran jî ew tiştê ku zarokan kom dikir li pêşiya malên feqîran dihatin danîn daku ew malbat sersala xwe bikin, û çavê wan ne li ti kesî be, û ev yek tiştekî ciwan yê civaka me bû,ku berdewam hizra xelkê me li alîkariya hejar û feqîran bû.Niha ew nerît berev nemanê ve çûye,hin kes caranan ew bi xwe vê yekê dirust dikin heta ku zarokên xwe fêr bikin, û dilê malbatên xwe xweş bikin.



Hin hevokên li ser sersalê:
“Serê salê, binê salê, sal qurbana kalê
Serê salê, binê salê, tiştekî biavên tûrikê vî kalî
Serê salê, binê salê, Xwedê jinekê bide zilamê malê
Serê salê, binê salê, Xwedê kûpekî zêr bide bûka malê
Serê salê, binê salê, Xwedê kurrikekî bide kebaniya malê
Serê salê, binê salê, Xwedê kurrikekî bide wê malê
Serê salê, binê salê, Xwedê mêrekî bide jinbî ya malê
Serê salê, binê salê, Xwedê mêrekî bide qîzika malê
Serê salê, binê salê, Xwedê zarokekî bide xwediyê malê

## Baslkên Aştiyê Ala Kurdistanê

Emel Hesen

Ji têrîja raperînê
Herkîn cûbarên Xwînê
Pesara çiyayî şêrînê
Vejiya sorgul jînê
Simbola tekoşînê

Şanaze rûmeta jînê
Elende Ala hebûnê
Nîşana pêşveçûnê
Peyama serkeftinê
Sirûda serxwebûnê

Bi saya Qazî û Barzan
Neviyên Rostim ê Zal
Bilinde Ala Kurdistan
Nîşana Xak û niştîman
Di nav alayên cîhan

Ne Faris û ne Çerkes
Qed nikarîn bidin ser
Ey Ala û Ceng û Çeber
Ax û Welat û netew
Li te pîroz be Xwîna gel

Serî rake Pakrewan
Qazî û Barzan û Rêbaz
Berze Ala serbaz û Baz
Di nav sengerên berxwedan
Em diden soz û peyman

Çiqas rabin şoreş û Ferman
Biparêzin rêbaz û Al
Em ê gûrî tekin ruh û can
Li ser rêbaza Barzan
Yan Kurdistan yan neman